Rapora YASA ya mehane
Navenda Kurdî ji bo Lêkolîn û Rawêjkariya Yasayî

Gulan, Pûşper 2010

YA§A e.V.

Kurdish Centre for Legal Studies and Consultancy

Kurdisches Zentrum für juristische Studien und Beratungen

Navenda kurdî ji bo lêkolîn û rawêjkarîya yasayî

المركز الكردي للدراسات والاستشارات القانونية

YASA e.V.
Postfach 7624
53076 Bonn
www.yasa-online.org

Mehmûd Sefo

Naverok:

- **Ji endamekî serkirdayetiya Partiya Çep re salek zindan**
- **Dadgeha leşkerî li Helebê zindan li sê çalakvanên kurd birî**
- **Kuştina leşkerên kurd di rewşine nepend de hên berdewam e**
- **Xwendekarekî kurd ji bo dadgeha leşkerî hate guhastin**
- **Li navçeya Kobanî Kurd bi koman hatin binçavkirin**
- **Hinek xwendekarên kurd ji ber seyranekê hatin girtin**
- **Elmanya dîsa dixwaze penaberekî kurd vegerîne Sûriyê**

Ji endamekî serkirdayetiya Partiya Çep re salek zindan
Di roja Yekşemê de 20.06.2010an dadwerê tek ê leşkerî li bajarê Qamişlo salek zindan li endamê nivîsgeha ramyarî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriyê **Mehmûd Sefo** birî. **Mehmûd Sefo** bi arandina kînên nijadperesetî û zavî û endamtiya komeleyeke nihênî û ne qeydkirî, ku tê de serkirde ye, hate tewanbarkirin. Tê zanîn, ku revdeya ewlekariya ramyarî li navçeya Dêrikê-Parêzgeha Hesiçayê ew di 28.03.2010an de binçav kiri bû.

Dadgeha leşkerî li Helebê zindan li sê çalakvanên kurd birî
Di 15.06.2010an de dadgeha tewankariyan a leşkerî du sal û nîv zindan li du girtiyên siyasî birîn. Ew jî ev in: **Dilşêr Xetîb Ehmed** ji bajarê Qamişlo û **Lorans Hecir** ji bajarê Amûdê. Herdû bi endamtiya rêxistineke siyasî, ku armanca wê dabeşkirina beşekî ji xaka Sûriyê û gihandina wî bi komareke biyanî ve, hatin tewanbarkirin. Herwiha li girtiyê siyem **Fewaz Mihyedîn**, ku ji bajarê Amûdê ye, salek û sê meh zindan hate birîn. Ew jî bi endamtiya rêxistineke siyasî hate tawanbarkirin.

Kuştina leşkerên kurd di rewşine nepend de hên berdewam e
Ji beriya çend salan ve leşkerên kurd di dema pêkanîna erkê leşkeriyê de li Sûriyê di rewşine nepend de tên kuştin û tu vepirsîn di derbarê vê kêşeyê de nabin. Ji destpêka sala 2010an ve û heya aniha pênc leşkerên kurd hatine kuştin:
-Necmedîn Hesen Dalo, di sala 1991an de, gundê Hêkçe, li Efrînê ji dayik bûye.Cendekî wî di 07.06.2010an de gihaye malbata wî. Ewî erkê leşkeriyê di koma Ên Îsa de li bajarê Reqayê pêk tanî û dora sê meh borandi bûn. Ji malbata wî hate ragihandin, ku ewî di dema çavdêriya şevî de xwe kuştiye.
-Mihemed Nezîr Dêro, di sala 1981an de li gundê Zor Mixor, li Kobanî ji dayik bûye. Cendekê wî di 30.05.2010an de gihaye malbata wî. Ewî erkê leşkeriyê li navçeya Hercelê li Şamê pêk tanî. Ew di destpêka Gulana 2010an de tev li artêşê bû bû û piştî 27 rojan ji kursê amadekirinê jiyana xwe ji dest da bû. Ji malbata wî hate ragihandin, ku dilê wî rawestiya û êdî jiyana xwe ji dest da. Lê piştî ku malbata wî li cendekê wî nêrî, şûna lêdan û azarîkirnê xuya kir, nexasim li ser lêv û serê wî.
-Xebat Elîko, di sala 1991an de li Efrînê ji dayik bûye. Di 07.05.2010an de cendekê wî gihaye malbata wî. Ewî erkê leşkeriyê li bargeheke leşkeran li navçeya Bokmal li ser sînorên Sûriyê û Îraqê pêk tanî. Hevalên wî ragihandin, ku di dema berdana agir de gule li herdû aliyên rast û çepê yên sînga wî ketine û herwiha li destê wî jî û ji ber birînên xwe jiyana xwe ji dest daye. Hate ragihandin, ku ew di bin kontrol û çavdêriyek mezin ji hêzên ewlekariyê hate binaxkirin. Herwiha ne dê, ne jî bavê wî ew dît û rê ji wan re venebû, da ku pirsa sedemên kuştina wî bikin.
-Osman Mistefa Bozan, di sala 1989an de li gundê Qilêç Wêranê li Kobanî ji dayik bûye û di nîvê Avrêla 2010an de jiyana xwe ji dest daye.
-Îsa Xelef Begê, di sala 1991an de li bajarê Kobanî ji dayik bûye û di 10.01.2010an de cendekê wî gihaye malbata wî.

Xwendekarekî kurd ji bo dadgeha leşkerî hate guhastin
Hate ragihandin, ku xwendekarê beşê rojnamevaniyê **Ridwan Reşîd Osman** di 20.07.2010an de ji bo dadgeha leşkerî li bajarê Reqayê hate guhastin. Ew di sala 1987an de li bajarê Girê Spî ji dayik bûye û rojnamevaniyê li zanîngeha Şamê dixwîne.

Hinek xwendekarên kurd ji ber seyranekê hatin girtin
Di 09.04.2010an de ewlekariya siyasî li bajarê Şamê hinek xwendekarên kurd di zanîngeha Şamê de binçav kirin. Hate ragihandin, ku ji ber amadekirina wan ji seyranekê re li parêzgeha Siwêda, ew hatine girtin. Xwendekarên ku hatine girtin, ev in:
Fedir Celal Keleş: Sala çarem e di beşê wêjeya Ingilîzî de.
Fîraz Ebdil Ezîz Reşo: Sala çarem e di beşê wêjeya Ingilîzî de.
Newaf Cemîl Xelo: Sala çarem e di beşê wêjeya Erebî de.
Yasîn Ebdil Hemîd: Sala çarem e di beşê Felsefeyê de.
Ebdela Nezîr Mihemed: Sala siyem e di beşê Felsefeyê de.
Hêvîdar Elî Mistefa: Sala çarem e di zankoya Perwerdekirinê de.
Kanîwar Derwîş: Sala çarem e di beşê Felsefeyê de.
Tîrêj Mîrza: Sala siyem e di beşê Felsefeyê de.

Li navçeya Kobanî Kurd bi koman hatin binçavkirin
Di mehên Avrêl, Gulan û Pûşpera 2010an de hêzên ewlekariyê li navçeya Kobanî bi koman welatiyên kurd binçav kirin. Di Avrêlê de dora bîst Kurd hatin girtin. Ew jî ev in: **Luqman Mistefa Nasan, Xelîl Osman Şêxo, Cerah Dawûd Şêxo, Salih Mihemed Bozan, Mihemed Elî Hac Evdo, Adil Xelîl Kero, Elî Mistefa, Derwîş Ebdil Qadir, Enwer Mistê, Mihemedê Îsê, Cuma Mihemed Îsê, Iskender Mihemed Îsê, Mihemed Mehmûd Mislim, Mistefa Mehmûs Mislim, Yaqûb Mehmûd Mislim, Hecî Ismaîl, Mihemed Ismaîl, Seyda Mehmûd û Ismet Şêx Hesen.**
Herwiha di 15.02.2010an de **Ebdela Mihemed Îso**, ku mafnasiyê li Misrê dixwîne, hate

binçavkirin. Û di 05.03.2010an de **Bozan Bozan Ebdil Qadir** û **Wehîd Xelîl Yûsif** jî hatin binçavkirin.

Elmanya dîsa dixwaze penaberekî kurd vegerîne Sûriyê

Malbata penaberê kurd ê sûrî **Farûq Îsa** ragihand, ku asayîşên elman **Farûq** di 21.06.2010an de li kargêriya biyaniyan li bajarê Wilhelmshaven binçav kirin. Ewî dixwest li wir dema kaxeta mayîna xwe ya sêmehane li Elmanya carek din dirêj bike, lê bi dest wî ne ket. Asayîşên elman ew birin dadgeha bajêr û li wir biryar di derheqê wî de derket û ew ji bo zindana Langenhagen nêzîkî bajarê Hannoverê hate guhastin, da ku paşê wî vegerînin Sûriyê. Hate ragihndind, ku ew dê di 18 an 20.08.2010an de bête vegernadin û heya hingî jî dê girtî bimîne. Welatiyê kurd **Farûq Îsa** di sala 2004an de koçberî Elmanya bû bû, lê mafê rûniştinê bi dest wî ne keti bû.